
# LAZЬMƏ ŢƏŞKILƏTE GYNDA, DЬHA MASSAA MOBI LIZASIA BЬKЬN SƏVA PEŞDABЬRЬNA CEKЬRЬN U HƏBUNA CЬMAƏTE.




Redaksia „Rja Ţəzə" dərhəq wəfatbuna himdare
ƏLЬFBAJE
Xəvatcije kyrmança
ISAAK MAROGULOVDA
Sərxyəşije dьdə, kylfəte mala wi.

## Zьmanzan u dərsdar

**„Lazьmə zьmaneki ţəvaji dərxьn, wəki həmu xəvatcije kyrmança bь wi zьmani bxunьn. Cekьn mədənjəta xyə, bqədinьn ņet mərəma Fьrqa Komunista."**

**I. MAROGULOV**

Mьr həvale **Isaak Marogulov** əw dərsdar, zьmanzan u xəvatcije ylmdarije bu. Zь zarotja xyə dxəvьti nava xəvatcije kyrmança Sa-'a 1904-əda dxəvьti nəhija Syrməlije gynde Zoreda (nav kyrmança). Dərsdare məktəba wedəre bu. U həma zь wan sala dəst pe kьri əw dxəvьti bona əfrandьna əlьfbaje kyrmançi, je ky bь dəşti wi bь ţəsdiq kьrьna hykymətə Şewre sala 1929-a hatə seri.

Həvale **Marogulov** nvisarkar bu. Əwi nava saled paşьnda 5 kteb bь zьmane kyrmançi da nəşr kьrьn. Wəxte əwlьnda, dxəvьti nava dara gazeta „Rja Ţəzə"-da.

Bь əfrandьna əlьfbaje kyrmançije, əw hərţьm dьfьkri dərəq peşdacujina zьmane kyrmançida. Əwi dgot:—Lazьmə zьmanəki ţəvaji dərxьn, wəki həmu xəvatcije kyrmança bь wi zьmani bxunьn. Cekьn mədənjəta xyə, bqədinьn net mərəma fьrqa komunista".

Cəwa zьmanzan, əwi bərəv krьbu əw həmu kьteb, je ky dərəq kyrmança bь başqə-başqə zmanava hatьnə nəşre. Le kanija wi məzьn əw xəvatcije kyrmança bun. Zь bəjt, kylam u gli gotne wanava rozbroz dda dəwləti kьrьne zanəbuna xyə dь dərəça peşdacujina zьmane kyrmançije Zь we zi əwi gələk-gələk bəjt, kyləm, sərhati u ħьkjat nvisinə.

Bь mьrьna ħəvale **Marogulovra** xəvatcije kyrmança ynda kьrьn zmanzanəki u dərsdarək məşur u bьljan.

**H. Çьndi, R. Drambjan**

***

Redaksia „Rja Ţəzə" dərəq wəfatbuna həvale **Isaak Marogulovda,** cəwa himdare əlьfbaje xəvatcije kyrmança u dərsdare əwlьn nav wanda, tera dьvinə 1) məktəbəkə gynde kyrmança bь ņave I. Marogulov bə, 2) Zьna wira ajlьq be gredan. 3) Dəs tnvisare wi, jek gələk sal hatьnə nvisare u gələki fərzьn bь mə, benə nəşr kьrьne.

Dərəq ve jəkeda redaksije pьrs danijə peşja organed zorьn.

Redaks. „R. Ţ".

A. Lalajan

## Dərhəq kara təzə təşkilkrьna yzəke gynda u xəvata wan sьreda.

Ţəşkiləte komsomola gyndda koməkdare zь həmuja əwlьn ja fьrqenə, səva şər kьn dərəq dəwləmənd krьna kolxoza u kolxozvana. Kolxozada gərək əm yzəke komsomola şərdar hazьr bьkьn, wəki əw şər kə peşbəri dьzmьne sьnьfe, mьqabьli gli gotьe wi, mьqabьli pəşmurdətja burzuazije hur, mьqabьli kulaka u dьzmьna, səva əfrandьna dissiplinəkə qəwin nav kolxoza, səva cebuna kolxoza bь balşeviki.

Səva we jəke zi lazьmə əm gyndda xəvata komsomola ysa təşkil kьn, wəki qəwat u krьna komsomola dь hər hələqe kolxozada əjan bə, wəki gli gotne wan dь hər xəvatada dərbaz bə.

Səva we jəke zi zь 15 tirmə hətta 15 təbaxe yzəke komsomola ja gynd hatьnə təzə təşkil krьne. Gyndda ņav kolxozada hatьn təşkil krьne yzəke nədəretije u territorialije.

Cənd nəhijada təzə təşkilkьrьna yzəke komsomola hatə gredane bь xəvate səjasətije—şьxyəlije gynda (beçərmiş krьna pəmby, bərəvkьrьņa nan u hasьləte, u je dьne).

Bəsa xəbəre, təşkiləte komsomola nəhija Qyrdyqylije wəxte təzə təşkilbuna xyə bь nəhijed majin candьna pəmbyra, şərte sosləçije greda. Hazьr krьn plane xəvate xyə. Zь 20-e tirme dəst pe krьn bərəvkьrьna sьmьla nav zəvijada u av dajina zəvijed pəmby-21-e tirme pioņere u şagьrte nəhije bь sərkarja yzəke komsomola dərkətьn cole səva puc kьrьna bhyked zьrardar. Xəvate ysa hatьn krьne nəhija Vaqpate u Qəmərlijeda zi.

Bь we jəke təşkiləte yzəke komsomola gələk zedə bu. Bəsa xəbəre, Axtajeda həbų 4 yzəke kolxoza, ię təzə təşkilkьrьne şunda, nav kolxoze ve nəhijeda hənə 34 yzək. Aqbaranede dəwsa 27 yzəka nha hənə 45 yzək, Bajazeta təzəda dəwsa 3 yzəka, hənə 15, Diliçaneda dəwsa 7 yzəka 27 yzək u je majin.

Le həma təzə təşkil krьn nəhijed başqə-başqəda u yzəkada əwqas zi kar nəda, cьmki gələ çlada burokrati u bь formi nezikí xəvate bun. Aqbaraneda. Içevaneda. Axtajeda. Aştarakeda u Basargecəreda nav yzəkada bь frəji əjan nəkьrьn u şro vənəkьrьn qrara Mərkəzkome F. K (b) Ţьvaqe je 15-e tirme.

Zь wan isbatana əm we fьkre dьkьn, wəki gələ nəhijada, həma xəvatcije təşkiləta komsomola zi, bь paki fəhm nəkьrьnə qrare Mərkəzkoma Fьrqe je Ţьvaqe.

Le həma səva təzə təşkil krьna yzəke komsomola zь təşkiləte fьrqe je çlja te xyəstьn, wəki əwana təşkiləte komsomolara koməkəke balşevikije ja rast bьdьn, təşkiləta komsomola dajnьn sər dərəçəkə dha bьlьnd u qəwin.

Ţərç. zь „Avangarte"

### Qytja nəma

**Nəhija Aqbarane.—Həvale Dьrbora,** Mьqala tə bь ņave „Mərьv hatə brindarkrьne" naje nəşre. Mьqalə mə şandijə sər milisiaje ņəhja wə, ja Aqbarane, bona pьrs u pьrssijar kьrьne. Zь we şunda tyje çava xyə bьstini.



Supas bo Enstîtuya kurdî ya Parîsê

